# NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

<u>Xebat ji bo :</u> *** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .**

*Ji we□anên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*

*Email :* **Newroz95@hotmail.com**

| Hejmar (81) | Tebax | 2008 z-2620 k | Buha (15 ) ps |
|---|---|---|---|


# Veger li alfebeya xebata netewî ya herî mirovane

Çendî rêxistin û partiyên kurd li Sûriyê li hev bikin û nekin , hinek ji wan biçûk bin , hejmara endamên wan li ser tuliyan be , anjî bi sedan û hezaran be , liv û xebata wan di çerçewa herêmekê de be , an li seranserî herêman û pir bajaran be , xwedî dîrok , helwest û pirogramek siyasî be , an dûrî pêvajoya dîrokî , ji nedî ve hatibe holê û di malperên entirnêtê de hatibe danasîn …hwd , dawiya dawî , kî ji wan rêxistin û partiyan karibe bi dil û can li zimanê dê bibe xwedî , û bikaranîna vî zimanî ji rêxistin û parta xwe re bike erkeke sereke , wê ciyê rêz hurmeta hemîyan be , nemaze gava berdewamî ji vê yekê re hebe û pêbawerî li cî be.

Weke mirovekî kurdhez , hin caran ji neçarî , tu dixwazî li alfebê û bingehên pirsa kurd li Sûriyê vegere , bîne bîra xwe û ya derdoran , gelo ma çê dibe partiyek kurd , bi şev û roj behsa kurd û kurdistanê , rûmeta netewî , mafên mirovan û demokrasiyê bike , û li zimanê xwe yê dê – zimanê xêrnedî – nebe xwedî , anjî bi çavekî biçûk lê binêre û bavêje paş guhan.

Dixuyê ji bîra dibe ku , hê di Radiyo û Telvizyona Sûriyê de , rê ji weşandina folklor , ziman û zaravayên hemî miletên dinyayê re vekirî ye , lê , tek û tenê li ber zimanê kurdî girtiye û xêza sor li ber e ! Rê li ber stran û zimanê Kambodî , Korî , Kirwatî , Ketelonî û Kerxîzî dûz û vekirî ye , lê li ber zimanê kurdî bi zinar û kevirên mezin girtî ye…!!

Koma partiyên kurd li Sûriyê dikarin herdem li ser vê xalê rawestin , têr şirove bikin û bidin ber çavan , ji ber ku mafekî netewî , mirovahî , navnetewî , xwezahî û xweristî ye , û digel rewşenbîrên kurd , xwedî pênûs û serbixwe , çi yên li hundir û çi yên li derve , tevdîrên bi pîvan , bi rêk û pêk bistînin .

Guhdana xwendin û nivîsandina bi zimanê dê , rastxwendin û rastnivîsandin , rêzman û rênivîs , nivîsarên bijarte û berhemên hêja…hwd , navnîşana xebata netewî ya herî durist û sereke ye , lewre jî berdewamiya weşana Newrozê bi zimanê me yê dê dimîne ciyê pîrozbahiyê.

**Sînorê yekta**

www.arsivakurdi.org

NÛÇE NÛÇE NÛÇE

## Piştî 7 Salan Dr. Delîlê Azad e



Dr. Arif Delîlê li zanîgehên Helep, Şam, Urdin û dewletên kendava Erebî karkiriye. Di sala 1986 an de, bi hin hevalên xwe re, şevbuhîrka sêşema aborî li dar dixe. Ji ber daxwaz û rastkrina rewşa welêt, ji kar tê avêtin. Bi cangorî di çalakên çandeyî yên ji bo azadiya mirov û rakirina zagonên awerte û bi taybetî, zagona El-twar de dixebitî. Lewr, di 9 ê Êlûna 2001 an de, Dr. A Delîlê ji hêla ewlekaya Sûriyê ve tê girtin. û di sala 2002 an de, bi ( gurkirina protestoyên çekdar) 10 sal ceza lê tê birîn. Û derdora 7 salan di zîdanê de dimîne. Û piraniya rojên zîndanê di tekzîdanekê de diborîne. Ji ber rewşa wî ya tendurstî ya xerab, Dr.A.Delîlê bi biryareke lêborînê ji serokê Sûriyê ve tê berdan.

Azadî ji hemî girtên nêrînê yên di zîdanên Sûriyê de

## Kuştina jinan

Li gorî rapora wezareta mafên mirovan ya Kurdistana başûr, di nav şeş heyvan de, 63 jin hatine kuştin û 190 jin jî xwe şewitandine.



**Hewlêr** : 32 jin hatine kuştin û 78 jin hatine şewtandin.

**Sulêmaniyî** : 15 jin hatine kuştin û 56 jin şewtandin.

**Dihokê** : 16 jin hatine kuştin û 56 jin hatine şewtandin.

## Dardakirin Li Îran

Li gorî biryara UN ya di dawiya 2007 an de hatiye girtin, ji bo qedexekirina bidardakirina mirovan, pir welatên cîhanî ew biryar pejirandin û li gor wê bryarê zagonên xwe guhartin.Lê mixabin hin welat jî , ew biryar nepejrandin û ji nav wan welatan Îran e. Li gor rapora dezgeha Amnesty Internasoyal ya mafên mirovan ku îsal, ta niha, li Iranê 187 kes hatine bidardakirin û di sala 2007 an de, 317 kes bûn. A.Internasyonal dibîne ku , bidardakirin jiyana mirovan bi dawî tîne, ew karekî hovane ye.



## Ji Komîta Şevbuêrkên Kurdî li Şamê re

Xwişk û birayên hêja…

Beşdarên birêz:



Bi bûneya 5 saliya Komîta we, **Komîta Şevbuhêrkên Kurdî li Şamê**, bi navê Kovara PIRSê, em we pîroz dikin, û hêviya berdewamî û serkeftinê ji karê we re dikin.

Hêvî û omîda me ew e ku em hemî bi hev re ji bo geşkirina zimanê kurdî di civakê de kar û xebatê bikin, evîna xwendin û nivîsandina bi zimanê dê, zimanê me yê kurdî belav bikin.

Careke din em we pîroz dikin, hêvîdar in ku xebata we ya ji bo zimanê Kurdî her pêşve here.

Kovara **PIRS** ê
24.07.2008 Z-2620 K

www.arsivakurd.org

## Birûsk

**Ji Komîta Şevbuêrkên Kurdî li Şamê re**

Xwişk û birayên hêja…

Rêz û silav:

Eve şeş sal di ser destpêka xebat û çalakiyên we re derbas bûne, bi armanca pêşxistin û bilindkirina ala ziman, wêje û folklora kurdî, we li paytexta welêt, li Şamê, xebateke bi rêk û pêk û hêja kiriye, bi dehan berhemên bi zimanê kurdî di şevbuhêrkên we de hatine xwendin û gengeşekirin, evîna zimanê zikmakî li nik keç û xortên me cih girtiye.

Ev karê we, cihê şanaziya me ye, karekî welatparêzî ye, em piştgiriya we dikin, hêviya berdewamî û serkeftinê ji we re dikin.

**Weşana NEWROZ**
**24.07.2008 Z- 2620 K**

## Heval Ebdilcelîl Xelîl Çû ber dilovaniya Xwedê

Roja Duşemê 11. 8. 2008, li Erebistana Siûdiyê, hevalê me yê giranbuha **Ebdilcelîl Xelîl** (BAVÊ ARAS) koça xwe ya dawî ji nav me bar kir û çû ber dilovaniya yezdanê mezin û dilovan. Di roja 18. 8. 2008 an de, roja Duşema reş, cendekê wî yê sar î bê rewan, li goristana gundê **Nebîsadî** bû mêvan. Ji beşdariya cemawerê pir, hêzên welatparêz û nûnerên partî û rêxistinan, dihate zanîn ku heval Bavê Aras cihekî xwe yê bilind û taybet di dilan de girtibû. Nemir **Ebdilcelîl**, di sala 1968 an de, li gundê **Nebîsadî**, herêma Dêrikê, ji dayik bûye. Raste ku çare li mirinê nabe, lê



belê mirina mirovekî xwedî bîr û baweriyên netewî weke heval Bavê Aras, nexasim li koçberiyê dûrî malbat, dost, heval û hogiran, gelekî giran û bi keser e. Her wekî ji gotina nûnerê partiya wî, Partiya Yekîtî a Demokrat a Kurd li Sûriy - YEKÎTÎ-, hate xuyakirin ku rûmeta xebatkaran cihê rêzgirtinê ye.

Bi navê weşana **NEWROZ**, bi dilên kovan û xemgîn, em bejna xwe li ber cendekê heval ditewînin û sersaxiyê ji malbat, dost û hevalên wî re dixwazin.

Herweha em sipasiyeke taybet ji revenda kurdî li siûdiyê re ji ber yekîtî û hevgirtina wan di bûyerên wisa de, hêviya pêşketin û serkeftinê ji wan dikin.

Aramî ji me tevan re, sersaxî ji malabata heval **Ebdilcelîl** re.û cihê wî buhişta rengîn be!.

(Weşana **NEWROZ)**

*******************************************************************

**Dumahîk : Kamuran ….**

Piştî axaftina wî, min herdem bi çavê bavê xwe li Mîr Kamuran dinêrî. Ji bo ku ez navê wî mezintir bikim û layêqî navê wî bim, min herdem xebatên xwe zêdeyî sînorê hêza xwe dikir. Îro jî şexsiyeta wî rêberiyê ji bo jiyana min dike. Ez bawer im sedema ku heta niha ez ji aliyê polîtîk û exlaqî ve li ser nigan mame, paya hîsên netewî yê ku min ji Mîr Kamuran girtî ne pir mezin in.

Dema mirov bala xwe bide Evdirehman Qasemlu û li ser şexsiyeta wî kur bibe, dê bê dîtin ku kaniya me yek e. Lê rewşa Evdirehman ji ya min erênîtir e. Ji ber ku mirinek bi şeref bû paya wî. Ji min re serbilindîyek mezin e ku, rojekî ez jî mîna wî ji bo gelê xwe şehîd bibim û ava şehadetê vexwim.

Ala ku Evdirehman Qasemlu bilind kiriye, îro jî di nava gelê wî de ye, her roj cihê xwe bilind dibe. Şerefa herî mezin jî ev e (Hatiralarim, Doz yay)…

www.arsivakurdi.org

# *Di 19'hemîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî de...*

## *GREVEKE GIŞTÎ LI ROJHILATÊ KURDISTANÊ*

*Azad Kurdî*

**G**elê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bona rêzgirtin ji yad û bibîranîna 19'hemîn salvegera Şehîd û terorkirina Dr. Qasimloyê rêber û hevalên wî, gireveke giresyî û berfireh a nerazîbûnê li bajarên Rojhilatê Kurdistanê lidar xistin. Heta bi vî awayî kerb, nifret û nerazîbûna xwe ji vê kiryara terorîstî a rayedarên rejîma Komara Îslamî a Îranê bona Şehîdkirina rêberê gelê Kurd, Dr. Qasimlo û kekê Ebdula Qadirî Azer di sala1989' anbidin xuyakirin.
Armanca bingehîn a vê girevê eva bû ku li jor me bas kir, ji ber ku gelê Kurd xwast ku çalakiya xwe bi awayê liv û tevgereke aştiyane û sivîl bimeşîne û bê bedeldayîn û xwînrijandin bihê rêve biçe. Çunkî di salên borî de, her tevger û çalakiyeke Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê bi tund û tûjî û zext û zorê hatiye bersivdan û dehan kes ji ber wan liv û çalakiyên aştiyane û meşên nerazîbûnê hatine Şehîdkirin û sedan kes hatin birîndarkirin û girtin. Gireva han a nerazîbûnê li ser bangewaza PDKÎ hate meşandin. Vê partiyê daxwaz ji gelê Kurd kiribû ku bi vê hencetê bi meşandina çend liv û tevgerên aştiyane û sivîl, Şehîdên Viyenê ên sala 1989'an bibîr bînin û siyasetên terorîstane ên rejîma Komara Îslmaî şermezar bikin. Lewra roja şemî 22'ê Pûşpera sala 1387'an a Rojî, hevberî 12'ê Tîrmeha 2008'an, bi hinceta 19'hemîn salvegera terorkirina Dr. Qasimlo, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û hevalên wî, li bajarên Rojhilatê Kurdistanê gireveke giştî hate meşandin û li bajarên Urmiye, Mehabad, Seqiz, Bokan, Şino, Nexede, Pîranşar û wd... dikan û bazar bi tevahî hatin daxistin û girêdan û hatin û çûn li gundan. ji bo bajaran bi tevahî hate sekinandin. Li tevahiya bajarên din ên Kurdistanê jî heta radeyeke xuya û berçav dikan û bazar hatine daxistin
Ji bilî vê çalakiya girseyî û mezin, her vê rojê û bi wê hencetê, seet 22'ê şevê bi dema Rojhilatê Kurdistanê,
piraniya xelkê Kurdistanê çirayên mal û cihên karê bo dema 3 deqîqeyan temirandin û bi vî awayî wefadariya xwe bi Dr. Qasimlo û bersiva erênî a xwe ji bo PDK Îranê xuya kirin. Her wiha êvariya wê rojê xelk li bajarên Rojhilatê Kurdistanê bi kincên Kurdî hatin ser rê û şeqaman.
Hêzên Ewlekarî û leşkerî ên rejîma Komara Îslamî a Îranê gellek hewl dan ku b tirsandina xelkê û gefxwarin ji gel, pêşgîriyê ji vê çalakî û gireva giştî a gelê Kurd bigirin, wan îcazenameya hemû dikandaran ji wan standibûn û bi xwe re biribûn û gef ji wan xwaribûn ku her dikandarek roja 22'ê Pûşperê, salvegera terorkirina Dr. Qasimlo û hevalên wî, dikanên xwe neveke, em dê derfata karkirina qanûnî, zagonî ji wan bistînin. Lê bi wan gef û hereşeyane û gellek yên din, xelkê biwêr û emegnas yê Kurdistanê guh û bala xwe neda rejîmê û bi girseyî û berfireh ew girev lidarxist. Di wêneyên bi vî nûçeyî re rastiya han tê xuyakirin.
Li hemû bajarên Rojhilatê Kurdistanê rewşa awarte hatibû ragihandin û li bajarên din ên Îranê hêz ji bo bajarên Kurdistanê hatibû anîn, lê gelê Kurd hêcet û mihana serkut û tund û tûjiyê neda destê wan û gireva han bi awayekî berfireh û girseyî hte lidarxistin û Dr. Qasimlo û hevalên wî hatin bibîranîn.
Agiri & Zarathustra News

www.arsivakurdi.org

## Kamuran Bedirxan û Evdirehman Qasemlu

Musa Enter

Ez dixwazim qala bîranîneke xwe bikim. Ji kurdên Îranê ji aliyê Urmiyê du bira li Stenbolê bi xwendina dibistanê mijûl dibûn. Hisêyn Qasemlu di zanîngeha teknîkê de dixwend û li wir dima. Ehmed Qasemlu jî li zanîngeha bijikiyê dixwend û li cem min dima.

Ez bawer im, di sala 1945 an de bû. Rojekî Hisêyn xortek lihevhatî û şiyar bi xwe re anî cem min. Ji min re got: Kekê Musa, ev jî Evdirehman e, birayê min yê biçûk e. Evdirehman Qasemlu li Îranê lîse qedandibû. Ji bo berdewama xwendinê hatibû. Xortek lihevhatî û pir dilpak bû. Ji awira civakî ve têra xwe germ bû. Herdu birayên wî, Ehmed û Hisêyn ne mîna wî bûn. Hewesa wan bêhtir li ser karê hunerî hebû. Lê Evdirehman dixwest beşê civakî bixwîne. Min alîkariya wî kir û di wê beşa dibistanê de bi cî kir. Li mala me, ya xwendevanan dima. Ne tenê li malê, piştî dibistanê jî dihate cem min, ji nik min nediçû. Bi hezkirin û germiyek mezin bi Kurd û Kurdistanê ve girêdayî bû. Di her fersendê de ji min re qal dikir ku, ew dixwaze here Ewropayê. Wê demê mala xwîşka Kamuran Bedirxan, Xwîşka Meziyet Bediraxê li aliyê Şişliyê bû. Kamuran Bedirxan jî li Parîsê dima. Me bi hev re, ji mehê carekî, roja înê ji mala wê, bi telefonê bi Kamuran re qise dikir. Rojekî bi rêya telefonê, min ji Kamuran re qala Evdirehman Qasemlu kir. Bi firehî li ser jîrekbûn û xwestina derketina wî ya Ewropayê zaniyarî da Kamuran. Kamuran ji min re go: ”Xwestina te er sera, ser çavan, lawê min. Wî bi rêbike. Ez ê jê re bursekî ji bo xwendinê peyde bikim”.

Dema min mizgînî da Qasemlu, pir kêfa wî hat. Lê min jê re go: ”Şertek min heye. Pêwîst e çûna te ji aliyê birayên te jî bê pejirandin”. Wê şevê bi birayên xwe re hatin serdana min. Birayên wî, çûna wî pejirandibûn. Lê pereyên wan tune bû. Wan dixwest bi nameyekî ji Îranê peran bixwazin.

Min ji wan re go: ”Ez tu pera ji we naxwazim. Çi pêwîst be ez ê bikim. Ew ne tenê yê we, her wisa birayê min e jî”. Me qeyda wî ji zaningehê paşde girt, ewraqên wî tekuz kir û bi rêya trênê şand Parîsê. Wê demê Şerê Duwê yê Cîhanê bi dawî hatibû… Piştî ku Evdirehman çû Parîsê, ne ji aliyê zaniyariyê û ne jî polîtîk çi caran têkiliyên xwe ji min qût nekir. Herdemê têkiliyên me hebû. Dema ji awira zimên û xebatê rewşa xwe baştir bû, li ser mijarên aşitî û pirsên ji min re balkêş bûn, ji kitêpxaneyan û zanîngehan ji min re dinivîsî. Kêfa Mîr Kamîran jî jê re dihat. Rêz û hurmeta Evdirehman jî li hemberî Kamuran û Xanima wî pir bû. Bi qasî lawekî nêzî wî dibûn. Mîr Kamuran xalê xanima min bû. Lewma ji min re digo: ”Xwarzê”. Lê rojekî di axaftina me bi telefonê de, ji min re wisa go: ”Lawê min, ji ber ku zarokên min çênedibûn, ez herdem xemgîn dibûm. Lê te û Evdirehman, we ev valahî dagirt. Niha ez pir dilxweş û kêfxweş im. Êdî mirin jî li zoriya min naçe”.

Belê, Mîr Kamuran bi vê axaftina xwe bavîtî da bû min. Bavîtiya wî ji min re cihê serbilindî û şerefê ye. **D.R( 3 )**

www.arsivakurd.org

# Osîtiyaya Başûr û Ebxaziya Du pirsên din li Qefqasê

**Rozad Elî**

Osîtiyaya başûr, beşê bşûr e ji herêma Osîtiyayê. Di sala 1878an de Rûsiyayê tevahiya Osîtiyayê dagîr kir. Piştî şoreşa Lênîn, û li dema Stelîn, Osîtiya kirin du perçe, yê başkur di nav Komara Rûsyayê de ma, û perçê başûr jî bi ser Gurcistanê ve xistin. Rûbera Osîtiyaya başûr 3900 $km^2$, hejmara Şêniyê wê dora 70000 kes e. Zimanên fermî Osîtî û Rûsî ne.

Herêma Ebxaziya li sala 1931ê bi ser Gircistanê ve xistin. Rûbera wê 86000 $km^2$. Hejmara rûniştvanên wê 200000 kes e. Zimanên fermî Ebxazî û Rûsî ne.

Piştî jevşelîna Yekîtiya Sovyêtê li sala 1990î, ew herdu herêmên ku di çarçewa dewleta Gurcistanê de mafê Xudmixtarî bidest xistibûn, doza cudabûnê ji Gurcistanê kirin û serbixwebûn danezanîn. Ji ber wê jî, şerine dijwar di navbera destlata Guricistanê, li aliyekî û çekdarên wan herdu herêman li aliyekî din çê bûn, li dawiyê û bi alikariya Rûsyayê hêzên Gurcostanê li wan herdu hêrêman têkçûn, ji Osîtiya û Ebxaziya vekşîn û herdu herêman jî serbxwebûna xwe ji Gurcistanê danezanîn. Lê belê, ew pirs bi şêweyekî aştiyane çareser nebû û Gurcistanê ew rewşa ku bi darê zorê çê bibû nepejirand. Ji ber wê jî, Pevgirêdana Dewletên Serbixwe ku li wê hîngê xort bû, hêzên aştiyê di wan herdu herêman de bicih kirin, û şer rawestî, lê belê pirsgirêka wek agirekî di bin xaliyê de ma.

Pişt re, Ebxaziya û Osîtiya gelek caran gazî li saziyên navdewletî kirin, ku pirsa wan bi Gurcistanê re, mîna pirsên gelên Belqanê, çareser bikin, û ji bo wê yekê gelek caran doza vepirsînê kirin, lê daxaziya wan guhên vekirî nedîtin.

Li destpêka meha Rezberê/Tebaxê, hukumeta Gurcistanê biryar stand ku bi darê zorê Osîtiyaya Başûr vegerîne bin sîwana xwe, lê wek hat dîtin artêşa Komara Rûsyayê li ber wê yekê rawestî, subayên xwe hêriş kirin û gihîştin nîvê welatê Gurcistanê û bi wê tevgerê pêlana serokê Gorcistan Salîkeşvîlî lê vegerand û têk bir.

Wekî ku tê zanîn, gelek dewletên ku roja îro xwedî sînor in, sînorên wan li ber roniya gelek tiştên tevlehev û bê dadî hatine danîn. Di piraniya caran de, ew sînor li gor encamên şerên mezin, yan di encamên talanên xwînrêj yên kevin de hatine danîn. Ango sînorên piraniya wan dewletan, bi şûr û xûnê hatine resim kirin û taybetmendî û dilxaziyên gelên di nav de dijîn jî hîç nehatine birin.

Ji bilî wê, li piraniya wan dewletan, eger sazûmanên wan nijadperestiyê najon jî, ew wekhevî û dadmendiyê li ser hemî pevgirên civakê û rûniştvanên wê nameşînin û herdem destê beşekî ji şêniyê wê deewletê di ser ên din re ye, bitaybetî jî eger sazûman ne demoqrat be.

Bi dehan nimûneyên demdirêj ku bêçare mane di vî warî hene, ew bûne wek birînên reş û kulên hilgirtî, guman heye ku di hemî deman biteqin û derbin, jixwe bi teqîna wan re, qeyran/kirîze peyda dibin, pêre jî dengê kuştin û kaviliyê bilind dibe û di encamê de ew pirs her diçin girantir dibin û mirovên sade dibin qurban.

Pirs û qeyrana Osîtiyaya Başûr û Ebxaziya jî du mînakên germ in di wî warî de, û hîn ew pirs bi rewşa ku niha gihîtinê bidawî ne bûne, loma jî xwînrêtin dê di vir de nesekine.

Di asta ku roja îro şaristaniya mirov gihîştiyê de, dem lêhatiye ku saziyên navnetewî têbigihên, ku nîr û mercên avakirin û hebûna gelek dewletan ne li gor bergeha azadiya mirov û gelan e, û gelek gel – biçûk û maezin- ji hemî mafln xwe û di serî ji mafên çarenûsî bêpar mane. →

**Dumahîk:**Osîtiyaya…

Ango nîr û mercên berê yên avakirina dewletan hatine guhartin , li bejna guhertinên şaristanî yên cîhanî yên vê dema nayên. Li ber roniya zagonên mafên mirov û gelan, tenê sînor, al, sirûda netewî û artêş dewletên biserkeftî çênakin û hemî tişt jî gereke ne tiştine pîroz bin, nemaze eger ew dewlet zordar bin û mafên gelên navxwe bipê dikin.

Roja îro gel, civak, ol.. çiqas biçûk bin jî, gereke mafê wan were paastin û bi şêweyekî dilxazane û li ber roniya dadmendî û wekheviyeke restî bijîn, cih û para hemiyan di şaristaniya pêşverû de hebe û çarenûsa her miletekî di destê wî de be.

Ji bo pêkanîna vê rastiyê, çare ew e ku hemî pirsên azadiya gelan, çi di hundur dewletekê de û çi di nav dewletan de bi riya zanîn, hiş, gotûbêj û bi şêweyên aştiyane werin çareserkirin. Ticarî hêz, artêş û kuştin pirsên dadmend, nemaze pirsên azadiya gelan ku dixwezin xwe li ber roniya şaristaniya nûjen bibînin û bijîn, bi darê zorê çareser nabin û namirin jî. Li bervajî wê, ew siyasetên tund û çewt ku li gelek deveran tê ajotin, di riya pêşdeçûna şaristaniya mirov de dibin kelem û astengên bê wate, û ziyandar.

Di rojhilata navîn bitenê de, gelek mînakên tunekirina azdiyê yên ziyandar ên giran hene, û şêweya çewt ya çareserkirina wan ta radeke bilind di paşdemayîna gelên navçê de paredar in. Wek pirsa gelê Kurd ku çar dewlet pê mijûl dibin. Pirsa Flestînê… û geline din jî.

Ew kêşe salê bi hezaran mirov dikin qurban, bi milyaran pere dirjên û bi dehsalan gel û milet li şûn dimînin.

Di nav Komara Rûsyaya Federal bi xwe de jî hîn gelek pirsên dadmend yên gelên Qefqasê bêçareserkirin mane û sazûmanê kamara Rûsyaya Federal dixaze doza wan ya serbixwabûn û azadiyê bi darê zorê bbitemrîne.

Baş xuya dibe ku piştgiriya tund ya Rûsiyayê ji mafê gelên Ebxaziya û Osîtiya Başûr re, gelek hesabên siyasî yên yaybet ên dûrî madariya wan herdu pirsan jî dide ber xwe. Çinkî gelek hesabên Rûsan bi Rojava re hene û Rûsî pê tengijîne, wek hesabên Belkanê, Mûşekên mûşekbir, xwexuşandina Nato bi rojhila’de, payebilindiya Rûsyayê ya ku kêm bûye…û hwd, gelek kînên xwe yên din yên nepen jî bi Emerîka û Yekîtiya Ewrupa re sax dike. Yanê piraniya dewletên mezin û di siyaseta cîhanê de xudî rol in, mafê gelan yê mafdar ji perjewndiyên xwe yên taybet re dikin mertal. Loma jî gereke mirov li dijî wê ton siyasetê rawesta û dengê xwe li hemberê bilind bike. Çinkî tirs ew e, ku sibe Rûsya mafê rewa yê ew herdu gelên biçûk di serbixwebûnê de, daxe bazara navdewletê û bi wan bihayeke erzan bifroşe. Ji bilî ku ew siyaseta çewt û kiryarên Rûsya û Gurcistanê jî buvehiyeke rastî û îjdil di navbera dewletên rojava û Emerîka de li hêlekî û Rûsya û alîgirên wê de peyda dike.

Em bawer in, ku ew herdu gelên Ebxazî û Osîtî doza mafekî rewa û dadmend dikin, û mafê çarenûna gelan li her demê û li her cihî mefekî rewa ye. Ew maf di hemî destûr û zogonên zemînî û ezmanî de hatiye nîşandan û pejirandin, û gereke ji hêla hemî dewletan ve bi awirên şaristanî û dadmend lê were nêrîn û bi şêweyên aştiyane û mafdar û dûrî berjewendiyên dewletên mezin û tundî û nijadperestiyê werin çareserkirin.

www.arsivakurdi.org

**Michael Chyet: Kurd bi qîmeta zimanê kurdî nizanin!**
**Hevpeyvîn: Sîrwan Hecî Berko**

Michael L. Chyet zimanzanekî cihû û emêrîkî yê zimanê kurdî ye. Ew 46 salî ye û bêtirî 30 zimanan xwendine.

Berî demekê, ferhenga wî ya 'Kurmancî-Ingilîzî' ji aliyê Weşanxaneya Yale University Press ve li Emerîkayê derket. Ferheng ji 847 rûpelan pêk tê. Gotinên kurdî bi tîpên latînî û erebî hatine nivîsandin û bi şêweyekî berfireh wateya wan a bi zimanê ingilîzî hatiye nivîsandin.

"Îşê vê xebata min bi siyaset û hikûmetan tune ye," wiha Chyet dibêje. "Ez xema paşeroja vî zimanî dixum û bi hêvî me, ku ez ê bikaribim alîkariya standardkirina wî bikim. Ez ji vî zimanî hez dikim û naxwazim ku bimre. Zimanê kurdî ne mirî ye, lê pêwîstiya wî bi Pêşvebirinê heye."

Michael Chyet berpirsiyarê beşê kurdî yê Radyoya Dengê Emerîka bû. Herweha ew profesorê zimanê kurdî li Zanîngeha Parîsê û Instîtûya Washingtonê ya Kurdî bû. Ew niha li Pirtûkxaneya Kongireya Emerîkî li Washingtonê kar dike.

Min li ser telefonê ev hevpeyvîn pê re kir:

MALPERA AMÛDÊ: Di pêşgotina pirtûka xwe de, tu bi şêweyekî neyekser bangî Kurdan dikî, ku xwedî li zimanê xwe derkevin, çimkî ew ber bi windabûnê ve diçe, wek ku te xwest bêjî. Çima wilqas tirs li ser windabûna zimanê kurdî?

**MICHAEL CHYET:** Berî hemî tiştî, ez mecbûr im bêjim, ku her tiştê ku ezê bêjim, dîtina min a şexsî ye û ne ya Pirtûkxaneya Kongirêsê ye. Ez mecbûr im wisa bêjim.

Ji ber ku ez dibînim -çi li Kurdistana Tirkiyeyê û çi li Ewropayê -, ku gelek Kurd hene, ku bi zarokên xwe re bi zimanên din dipeyivin, çi tirkî be, çi firensî be, çi elmanî be, çi ingilîzî be. Zarokên wan bi kurdî nizanin, yanî paşeroja vî zimanî di bin gefê de ye. Dirûşma min li ba Kurdan bila wisa be: 'Zimanekî wisa ku zarok pê nepeyivin, zimanekî bê paşeroj e'! Her tiştê ku Tirkan ta niha kiriye, ku zimanê kurdî ji nav bibin, tesîra wê nebû, yanî ziman nebir. Lê niha her tişt tê guhertin. Rewş hatiye guhertin. Û eger Kurd bi xwe xwedî li vî zimanê dernekevin, ditirsim ku 20 salên din ev ziman namîne.

**Tu behsa Kurdên ji derveyî welat dikî..**

Çi ji derveyî welat, çi li hundirê welat. Bo min niha herdu yek in. Gelek Kurd qîmeta zimanê kurdî bi serê xwe fêm nakin. Gelek Kurd zimanê kurdî bi kar tînin, da ku hikûmeta tirkî nerehet bikin. Ew bi xwe nabînin zimanê kurdî çiqasî xweş û bedew e. Eger Kurd bi xwe zimanê xwe neparêzin, ew dê winda bibe, ji holê rabe.

**Tu behsa Kurdên Bakurê Kurdistanê dikî. Problêma Kurdên din tune ye?**

Li Kurdistana Tirkiyê navbera 12-20 milyon Kurd hene. Li Sûriyê mesele tiştekî din e, û li Iraqê jî tiştekî din e. Li wan deveran gef bi awayekî din e.

**Ta niha standardek ji bo zimanê kurdî peyda nebûye. Tu vê yekê problêm dibînî?**

Ta niha, me nikarî zimanekî standard biafrînin. Wexta ku em - gava ku dibêjim 'em', ez jî tê de me - xwe yek bigrin, divê em zimên jî yek bigrin. Hemî hicetên ku berê hebûn, kêm bûne yan nemane. Niha, ji ber internêt, televizyon û radyoyê, Kurd dikarin bigihên hev. Haya min li Tirkiyê jê heye, Kurdên Sûriyê, Iraqê û Îranê çi dikin. Herweha ez dikarim di rêya internêt û televizyonê bizanibim ka ew kîjan peyvan bi kar tînin. Kurdên Tirkiyê ne dizanî, ka xuşk û birayên wan li Sûriyê, Îraqê û Iranê çi ji bo filan peyvê digot; haya wan ji hevdû tune bû. Lê îro rewş ne wisa ye; êdî hatiye guhertin. Herkes dikare bikeve internêtê û bibîne, an jî li bernameyên →

www.arsivakurd.org

radyo û teLevizyonan guhdarî bike, ka Kurdên beşên din kîjan peyvê ji bo filan tişt bi kar tînin. Ne hewce ye, ku ez bê agah bimînim.

**Standardkirina zimanê kurdî karê zimannasên kurd e, an yê siyasetmedaran e, an jî yên mirovên 'normal'e, an karê hemî Kurdan e? Ji bo vê yekê çi divê pêk were?**

Ez bi xwe gotina 'siyasetvan' bi kar tînim; ji bo min 'siyasetmedar' farisî ye. Gelek Kurd wiha difikirin, ku taqeta wan ji bo guhertina rewşê tune. Lê ez dibêjim na, wisa nîne. Her bavê kurd dikare li mala xwe biryarê bide, ku 'ji îro û pê ve, em ê tenê bi zimanê kurdî bipeyivin û vî zimanî biparêzin. Li derve di nav kuçê de, ew tiştekî din e, lê di nav malê de emê hewl bidin vî zimanî biparêzin'. Her bav dikare biryareke wisa bide, çi li Kurdistanê û çi li Ewropayê.

**Derbarî vê yekê, tu xebata hêzên siyasî yên kurd erênî an neyênî dibînî?**

Eger ew bi xwe hînî rêzimana zimanê kurdî û peyvên nû bikin, dê gelekî başbe. Lê ta niha, gelek siyasetvanên kurd an bi tirkî, yan bi erebî, yan bi farisî dipeyivîn. Wan xwe bi van tiştan ve mijûl nedikir. Lê bi rastî ez nizanim ka rewş îro çawa bûye.

**Gelek Kurd bi zimanê dagîrkeran difikirin û bi zimanê kurdî dipeyivin. Tu li ser vê yekê çi dibêjî?**

Ji bo min giring e, ku gava ku mirov peyvên standard ji bo radyo û televizyonê biafrîne, gerek mirov wisa bifikire, ne 'di gundê min de çawa dipeyivin'. Daxwaza min ew e, ku ta li dûrtirîn gundê Kurdan her kes bi hesanî fêm bike ez çi dibêjim. Li gor vê yekê, divê ez gotinên xwe bibjêrim. Bo mînak, li Kurdistana Tirkiyê gelek kes bo 'telefonkirin' 'lêgeran' bi kar tînin, ji ber ku bi tirkî dibêjin 'aramak' (bi kurdî: ezê li te bigerim, yanî ezê telefonî te bikim). Lê eger tu ji Kurdekî Sûrî, an Iraqê an Îranê bipirsî 'ez ê li te bigerim, yanî çi?', ewê tiştekî din fêm bikin. Ew fêm nakin, ku mebesta te telefonkirin e. Ewê wisa fêm bikin, ku tu yê derkevî û li bin keviran lê bigerî.. *(dikene)*

Ji ber vê yekê, ez dibêjim, ku bila gava pêşîn ev be, ku em xelkê agahdar bikin, ku gava ew peyvên wisa bi kar bînin, ev dibe astengek li ber yekgirtina zimên jî û xelkê jî. Di nav Kurdên Sûriyê û Iraqê de jî gelek peyvên di bin tesîra zimanê erebî de hene, û li Îranê jî peyv hene, ku di bin tesîra zimanê farisî de ne. Ev gava pêşîn e. Haya kêm kesan ji vê meseleyê heye. Piştî ku me ev kes agahdar kirin, ku pirsgirêkeke wisa heye, wê demê em dikarin li hev rûnên û bifikirin, ka em çi ji bo yekgirtina zimanê kurdî bikin. Eger her kes di vê proseyê de beşdar be, hewasa wan jî dê bilindtir be. Ew dê bêje: 'weleh tiliya min jî di vî karî de heye, û ji bo min jî giring e, ku bi ser keve.'

**Gelek rewşenbîr û zimannasên kurd tim dibêjin, ku ger welatekî meKurdan çêbibe, hemî pirsgirêkên ziman çareser dibin. Tu çi dibêjî?**

Belkî tu Kurdistan çênebe jî..

Bi dîtina min, gotineke wiha tê wateya, ku 'êdî em naxwazin û em zimanzan nînin, bo me siyaset giring e. Em ji zimanan û ji zimanzaniyê fêm nakin. Em ê bihêlin ta dewlet çêbibe.'

Bi rastî ihtîmaleke mezin heye, ku tucar tiştekî wisa (Kurdistan/SHB) çênebe. Bo min, eger em weke mînak li vejandina zimanê ibrî binerin, Isarîl di sala 1948an de hate damezirandin. Lê vejandina zimanê ibrî hinekî zûtir dest pê kiribû, di destpêka sedsala 20an de. Gelek Cihû bi vejandina zimanê ibrî ve mijûl bûn. Ez dibêjim, ev mînakeke başe bo Kurdan. Ne hewce ye, ku em li hêviya damezirandina dewleteke kurdî bimînin, ku em zimanê kurdî bi pêşxînin.

**Em çi bikin?**

Bi rastî, em dikarin di rêya televizyon û internêtê gelek tiştan bikin. Fekirîna Kurdan ew e, ku her kes di geliyê xwe de dijî, bêyî ku lêbikole, ka ta îro çi ji bo standardkirina zimanê kurdî hatiye →

www.arsivakurdi.org

# Dibistan Nîşna Xêr-Bêrê Ye

**Enehîte morad**

**Va** ye em , li ber deryê salike nû ji vekirina dibistanan e .Wisan jî, xwediyên şagrtan , di nava xem û qisawetan de , gêjo –mêjo dibin . Nemaze di ev bihabûna her tiştî ku pişta mirov dişkînede , ev ji hêlekê ve û li hêla dî ve jî , ew zarokên sala yekê diçine dibistanê, pir cefa û dijwariyê di warê fêrkirina zimanê biyanî [Erebî] de dibînin . Bê ku karibin têbigêhin an jî,fêmbikin ku , çima û ji bo çi ew li malê bi zimanê dê [ kurdî] daxife û li dibistanê bi zimanê biyanî [ Erebî] diaxife û fêrî xwendinê dibe. Vêca jî zarokên me, di nava nakokî û heyamekî ne tundirstî de xwe nasdikin, her wisan jî , birek ji zarokan bi girî , şîn û kotek diçine dibistanê ne mamoste û ne jî ,xwediyên zarokan dikarin êş û hestê zarok yê nazik û bi çûk nasbikin û bi dilovavî bipejirînin . Belikîm karibin jana wî sivik bikin , çiqas girînge ku xwediyên zarok pêre biçine dibistanê û dostaniyê bi mamostên zarok re çêbikin ta ku , bi hvdure alîkar bin hingê hêmenî di dilê zarok de çî digire, evîna çûna dibistanê li rex wî geş dibe .Ne gengaze ku , em berê zarok bi kotek ,pû û lêdanê bidine dibistanê . Zor girînge ku , dibistan di baweriya zarok de nîşana xêrê be , ne jî li pêş wî tirs û bive be !
Ci qas mixabin, birek ji xwediyên zarokan hene, tenê zarokên xwe dişînin dibistanê tû hew . Tu carî lê napirsin ku , ew zarok mîna sêwî û bêxwedî li pêş heval û mamostên wî nîşan dibe! Bi vê awî hino-hino, zarok ji dibistanê hirçipêlî û vedicenije. Piştire bê guman ew dibistanê berdide ji jiyana çandî û xwendinê bi dûr dikeve . Xwediyên ev tun şagirtan , bê erê û na berê wî zarokî didne hin pîşe û karine ne li yaq û gora temenê wî yê biçûke .
Ev yekek ji pirsgirêkên gelê me yê kurd li vê sûriyê ne . Çiqa pir mixabin liugel ku, serdema me ya , sedsala bîst û yekan e ,hê jî dibistanek bi zimanê me kurdan, li vê welatî nine ! Ma gelo ev nîşana çî ye?. Ne ya rûreşî û setemê ya tersî şaristanî û pêvajoka demê ye !.
Vêca jî zor girînge ku , em li zarokên xwe xwedî derkevin ,êş û jana wan nsbikin, her tiştî li gora hiş û ramna wan şirofe bikin û ne jî wan di tariyê de bihêlin . Ji ber ku zarok senbola berdewamî û duhatiya miletan e , û hebûna dibsitanan jî, nîşna xêrê ye , weke helibestvanê nemir Cîger-xwîn gotiye : Xwendin nebe kes naçe pêş… peyda dibin pir derd û êş .
Li dawî , bi navê me û komîta Newrozê û bi boneya sala nû ya xwendinê, . em serkeftinê û rojên xweş û geş ji hemû zarok û xwendekarên kurd re hêvî dikin .

# Bêhêviya Narînê

**Hesenê Cumî**

**Di** komcivînekê de, berpirsiyek ji tevgera me, dest bi axaftan xwe dike. Li ser rewşa welêt û bi taybetî ya tevgera Kurd li Sûriyê radiweste. Şerekî tûj û bi kîn ji hin basikên tevgerê re dike.... û li dawiyê xwe tenê dibîne.

Beşdar dest bi pirs û gotinên xwe dikin. Berpirsiyar bersivên beşdaran dide. Di quncikekî de, keçeke çeleng, di hundrê xwe de dikele, keserên kûr dikşîne. Li dawiyê destûr dixwaze û bi dengekî şîn dibêje:

Ev demeke dirêje ku, ez li komjvînan beşar nabim. Ji ber gava ez berpirsiyrekî tevgerê dibînim, her dere bêhêvêiyên min mezintir dimin. Xuyaye, evqas guhartinên li seranserî cîhanê, -ji hilwaşndina Sovyêta berê, dîwarê Berlîn, Hevbenda Warso û şoreşa teklolojî- bûne, haya tevgera me jê nîne. Hîn bi mêjiyê êl û eşîran mijûl dibin. Ev gotinên maosteyê hêja yên li ser hin basikên tevgerê , gotina pîrejina hişmend, Henîfa Oskê atîne bîra min. ( ***Ji herêma , herêma me, ji herêma me, gundê me, ji gundê me, mala me û ji mala me ez).***

Eger em li porgiramên basikên tevgera me ya Kurd li Sûriyê vegerin, emê bêguman van tiştên hevpar û sereke bibînin.

1- Hebûna miletê Kurd li Sûriyê, yê li ser axa xwe ya dîrokî .
2- Du pirojeyên kirêt û ne mirovane, yên ji hêla destlata Sûriyê ve, li ser Kurdan hatine ajotin, ew jî KEMBERA earbî û SERJIMARA awerte ne.
3- Çaereserkirina pirsa Kurd li Şamê ye.
4- Bi destxistana mafên netewî, di çarçewa Sûriyê de.
5- Şêyewyên kar û xebata tevgerê, yên aştiyane û demokrat in.

Gelo: Ev xalên jorîn yên me jimartine, ne bes in ku, basikên tevgera me di bin siya wê de bicivin û lihevbikin!?.Basikeke ji tevgerê, çiqas mezin an bi çûk be, bi tena xwe kane çibike!?. Hejmara endamên wê, yên li civatan beşdardibin li gorî gelê Kurd li Sûriyê çiqas in!?.

Hêviya min ew e ku, rojekê ji rojan , ez bibînim ku, berpirsiyarek ji tevgera me, di komcivînekê de li ser kêmkasiyên partiya xwe bisekine û rexnên beşdaran bipejrîne.

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurdi.org